

GELO TU LI WELATÊ POTEKÎZÊ (PORTEGAL) DIJÎ, LÊ DIXWAZÎ KU VEGERÎ WELATÊ XWE YÊ JÊDERK Û TE HEWCETÎ BI PIŞTGIRIYÊ HEYE?

Digel Rêxistina Navneteweyî ya Koçberiyê (IOM) bikeve têkilliyê

Bernameya piştgiriye jibo Vegeriyana Dilxwazî û Sazbûna dubare digel Civakê (Ve-Entegrasyon) - ARVoRe VII Çi ye?

Rêxistina Navneteweyî ya Koçberiyê (IOM) bi armanca raberkirina piştgiriye ewleh û hêja bo koçberên li ber zianê û lawaziye li Portekîzê ku bi awayekî dilxwazî dixwazin vegerin welatê xwe yê sereke, lê şiyana wan a aborî jibo vegeriyane tune, bernamêyê bi navê 'ARVoRe VII' organîze kiriye. Bûdceya vê bernamêyê bi awayê hevpar ji aliyê Sindoqa Koçberî û Sazbûna Civakî (Entegrasyon) a Penaberan (AMIF) û Xizmetên Sînorî û Koçberiyê ya Portekîzê (SEF) tê dabînkirin.

PÊVAJOYA XEBATA WÊ BI ÇI RENGÎ YE?

1. Digel me bikeve têkilliyê

Biryardana li ser vegeriyana bo welatê xwe dikare dijwar be. Tîma IOM'ê amade ye ku pêvajoya xebata bernamêyê û piştgiriye tîn raberkirin ji te ra şirove bike û bersiva pirsên te bide da ku bikarî biryareka dilxwazî û bi agahdarî bidî. Ev şewirîn bi awayê xusûsî û nihênî ye.

Tu dikarî bi rêya telefon, Email, Facebook an WhatsApp'ê digel Ofîsa OIM'ê li Lisboa'yê têkilliyê dayînî.

2. Biryara xwe bide

Piştî ku hemî pêvajoyên têkildarî xizmetên me ji te ra hatin ravekirin, her çiqasî ku pêwîst be, te yê dem û derfet hebe ku li pêngava din bifikirî.

Girîng e ku bizanibî di her qonaxeka vê pêvajoyê da, heta piştî endamtiya di bernamêyê da, dikarî nêrîna xwe biguherînî.

3. Endamtiya di bernamêya "ARVoRe VII" da

Tu dikarî li Lîsbonê jibo IOM'ê dorê bigirî. Heke tu li Lîsbonê najî, em dikarin agahiyên têkîlligirtinê yê nêziktirîn rêxistina

hevkarê ARVoRe VII'ê ku li cihê jiyana te ye, radestî te bikin. Tora piştevaniya bernamêyê pitir ji 30 hevkarên cûrbicûr li seranserî kewşenaa neteweyî ya Portekîzê hene, pêkhatî ji navçeyên xweser ên Madîra û Azorê (Madeira and Azores), ku te qebûl dikin û amade ne ku hemî zanyariyên lazim bidin ber destê te û endamtiya te di bernamêyê da tomar bikin.

4. Piştgiriya rewanî civakî

Piştî endamtiya di bernamêyê da, dikarî daxwaza piştgiriya Rewanî (derûnî) Civakî ya beriya vegeriyana bo welatê xwe raber bikî. Renge te bişînin rêxistineka hevkar a pîspor di warê piştgiriya Derûnî-Civakî li Portekîzê.

5. Alîkariya birêketinê

Piştî wê yekê ku bernamêyê daxwaza te piştrast kir, emê digel te bikevin têkilliyê ku gelo tu jibo çûyîne amade yî û emê jibo te bilête werbigirin.

Emê di roja çûyîna te da li balefirgeha Lîsbonê bin, bilêta te ya firokeyê dê amade be û di tevahiya pêvajoya siwarbûna li firokeyê da emê hevrêtiya te bikin.

Piştgiriye bernamêya 'ARVoRe VII' pêkhatî ne ji:



Bilêteka firokeyê, jibo rêya herî rasterast û bi mesrefa herîkêm bo welatê te an bo welatekî navcî ku wergirtina te misoger kiribe;



€50 dirav di roja çûyîne da jibo dabînkirina mesrefên ihtimalî di heyama seferê da.

6. Piştgirî jibo Sazbûna dubare digel Civakê li welêt sereki

Piştgirî jibo Sazbûna dubare digel Civakê li welêt pêkhatî ne ji:

- Şêwirîn: Beriya birêketinê, tîma me dikare zanyariyên pêwîst jibo vegeyriyana te bo welatê xwe, bide ber destê te;
- Di hin babetan da, û li gorî hewcetiyan te, derfeta raberkirina piştgiriya aborî li wwelatê te bixwe jî heye, wek mînak piştgirî jibo damezirandina kar û pêşeyeka biçûk an dewreyeka teknîkî lêcûnên pizîşkî. Piştgiriya malî û aborî pêka hewcetiyan her kesekî ciyawaz e û dikare heta asta jorîn a €2000be.

Daxwazên piştgiriye jibo Sazbûna dubare digel Civakê divê beriya birêketinêpêk bèn. Heke daxwaza te were piştrastkirin, beriya vegeyriyanê, tu yê werî haydarkirin. Kit bi kitê babetên

piştgiriye jibo Sazbûna dubare digel Civakê anku Ve-Entegrasiyon ji dema amadekirina bernameya Sazbûna dubare ya kesane digel Civakê heta 6 mehan çavdêrî û şopandin di welatê sereke da dê bèn çavdêrîkirin.

PIRSÊN NASYAR

Malbata min jî bi min ra ye, gelo ewna jî dê ji sûd û serpişkiyên bernameyê sûsê werbigirin?

Belê. Ev bername hem daxwazkerên kesane dipejirîne hemî jî daxwazkerên malbatî. Ev bername kesên kêmtir temen jî werdigire, çî wan sergêr hebe çî tunebe.

Di çî rewşekê da sûd û serpişkiyên bernameyê nabin para min?

Çar rewşên taybet hene ku tu nakevî bin sîvana piştgiriya IOM'ê:

1. Heke tu welatiyê welatekî endamê Yekîtiya Ewropayê (EU) yî an xizmekî te welatiyên welatekî endamê Yekîtiya Ewropayê ye;
2. Heke kêşeyeka te digel Pergala Dadweriyê ya welatê Portekîzê hebe ku rê nade vegeyriyê welatê xwe;
3. Heke te pêştir sûd û serpişkiyên vê bernameyê bi kar anîbin;
4. Heke tu gotinên nerast raber bikî;

Berçavnegirtina van şert û mercan an pêşmercên din ên têkildarî bernameyê dikare bibe sebeba bêparbûna te.

Jibo navnivîsandinê çî belge pêwîst in?



Passport
(Bawerpêkirî an Dem-derbasbûyî)



Her cûre belgeyên selimîner jibo **Girêdayibûna Rêxistinê**



Her wiha **Destûra xwe ya Mayînê (Îqamet) (heke berdest be)** raber bikî.

Heke te hîç belgeyekaa naskirinê tune ye, ji kerema xwe digel IOM'ê bikeve têkiliyê.

Gelo ev piştgiriyan vegeyriyanê hin xerc û mesrefan davêjin ser milê min?

Na. Bernameya 'ARVoRe VII' xerc û mesrefên çûyînê û piştgiriyan raberkirî dipejirîne û dê tu xerc û mesrefek neke ser bikarênerên bernameyê.

Gelo bi sûdwegirtina ji sûd û serpişkiyên vê bernameyê, dê hin sînardariyan taybet li ser min bèn sepandin?

Belê. Di Qanûnên Heyî da (Xala 139 – Piştgirî ji vegeyriyana dilxwazî, Qanûna Hejmara 23/2007, 4ê Tîrmehê ku hêza qanûnî ya têketin, mayîn, derketin û dersînorkirina welatiyên biyanî ji kewşena neteweyî piştrast dike, li gorî pêveka sererastkirinê ya Qanûna Hejmara 29/2012, ya pesendkirî di roja 9ê Tebaxê (Agûst), Qanûna Hejmara 56/2015, ya pesendkirî di roja 23ê Hezîranê (Juen), Qanûna Hejmara 63/2015 ya pesendkirî di roja 30ê Hezîranê, Qanûna Hejmara 59/2017 ya pesendkirî di roja 31ê Tîrmehê, Qanûna Hejmara 102/2017 ya pesendkirî di roja 28ê Tebaxê, Qanûna Hejmara 26/2018 ya pesendkirî di roja 5ê Tîrmehê û Qanûna Hejmara 28/2019, ya pesendkirî di roja 29ê Adarê), du cûre sînardarî jibo sûdwegirên bernameyê hatine pêşbînîkirin:

- **Qedexetiya hatina bo Portekîzê bi qasî 3 salan;**
- Heke te destûra Mayîna Qanûnî li Portekîzê heye, divê ku destûra xwe ya mayînê di Lêgerîna Sînorî ya Xizmetên Sînorî û Koçberiyê ya Portekîzê (SEF) radest bikî.

Heke ez bixwazim ku beriya bidawîhatina qedexetiya 3 salî ya hatina bo Portekîzê, vegeyriyan vî welatî, divê çî bikim?

Qanûnên Heyî (Biryara Wezaretî ya Xala 80, li gorî Biryara Hejmara 84/2007, Qanûna Hejmara 23/2007 ya roja 4ê Tîrmehê, ku hêza qanûnî ya Têketin, Mayîn, Derketin û Dersînorkirina welatiyên biyanî ji Kewşena Neteweyî piştrast dike) dinivîsîne ku heke te dil heye ku beriya bidawîhatina qedexetiya 3 salî ya hatina bo Portekîzê vegeyriyan vî welatî, divê digel Konsûlxaneyê Portekîzê li welatê ku li wir dimînî bikevî têkiliyê û daxwaza wergirtinê raber bikî. Raberkirina wergirtinê (jibo hatina dubare bo Portekîzê) girêdayî bi vegeyriyandina pereyê têkildarî piştgiriyan pêkhatî ji te bo dewleta Portekîzê ye, nemaze: Bihayê bilêta firokeyê, diravê ku li balefirgehê radestî te hat kirin û pereyê Sazbûna dubare digel Civakê (Ve-Entegrasiyon) (Heke te ji bê piştgiriye sûd wergirtibe). Dê sûda bi nirxa qanûnî li vî pereyî were zêdekirin.

Rêxistina Navneteweyî ya Koçberiyê

Em kî ne

Rêxistina Navneteweyî ya Koçberiyê (IOM) rêxistineka ser bi Rêxistina Neteweyî Yekbûyî (NY) jibo Koçberiyê ye. Baregeha sereke ya vê rêxistinê li Ceneva Swîsreyê ye û bask û navendên wê di zêdeyî 150 welatan ji wan li Portekîzê hene. Pêspartiya IOM'ê ev e ku koçberiyên jibo xêra giştî organîze bike û bingeh û esasa xebata wê ev xal e ku koçberiya birêkûpêk û bi rewşa mirovî sûdê digihîne Koçberan û Civakê.